# ZANYARIYÊN GIŞTÎ

## 1. Mercên Wergirtina Kelmelan

Mercên Wergirtina Kelmelan ji hêla Xizmetên Rifaha Civakî ve li ser bingeha Qanûnên Penaberan, wekî hatine guhertin û/an jî hatine dewsguhertin, tên dayîn.

Di Mercên Wergirtina Kelmelan de ev dê hebin:

1) Alîkariya malî ji bo pêdiviyên bingehîn (xwarin, cil û pêlav).
2) Alîkariya malî ji bo ceryan, av û xerc û lêçûnên kesane yên piçûk. Dê qasa alîkariya malî ya ji bo lêçûnên kesane yên piçûk li gorî cihê rûniştina serlêder were destnîşankirin.
3) Alîkariya kirê ku didin xwediyê xaniyî.
4) Ji pêş ve dayîna diravê kirê

Rêjeya Mercên Wergirtina Kelmelan li ser bingeha biryareke Encumena Wezîran a têkildarî dayîna Mercên Wergirtina Kelmelan ên Serlêderan bo Parastina Navneteweyî tê destnîşankirin. Qas li gorî hejmara endamên malbatê tê destnîşankirin; ew qasên herî zêde ne ku tên dayîn û di bin tu şert û mercan de nayên zêdekirin.

| Hejmara endamên malbatê | Xwarin, cil û pêlav | Dema ku peymaneke kirê tê pêşkêşkirin ceryan, av û lêçûnên piçûk | Ceryan, av û lêçûnên piçûk dema ku peymaneke kirê NAYÊ pêşkêşkirin |
|---|---|---|---|
| | €186 | €75 | €28 |
| | €279 | €100 | €37 |
| | €372 | €140 | €52 |
| | €465 | €170 | €63 |
| 5 û zêdetir | €558 | €200 | €74 |

| Hejmara endamên malbatê | Alîkariya kirê | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | Nicosia | Limassol | Famagusta | Larnaca | Paphos |
| | €100 | €100 | €100 | €100 | €100 |
| | €200 | €218 | €146 | €174 | €146 |
| 3 heya 4 | €290 | €317 | €211 | €252 | €211 |
| 5 û zêdetir | €364 | €397 | €265 | €315 | €265 |

## 2. Sûdmendên Mercên Wergirtina Kelmelan

Sûdmend **serlêderên Parastina Navneteweyî** ne, **kesên ku bo wan dayîna Mercên Wergirtina Kelmelan li Navendên Wergirtin û / an Mayînê ne**

**pêkan e**, ew li deverên ku ji hêla Komara Qibrisê ve tên kontrolkirin dimînin û hem serlêder û hem jî endamên malbata wan mercên jêrîn bicîh tînin:

- Divê tu endamek ji malbata serlêder nexebite.
- Eger serlêder an endameke malbatê kar bike, malbat dikare wergirtina yarmetiyê berdewam bike bi şertê ku dahata mehane li gorî tabloyên jorîn ji tevahiya yarmetiya ku mafê malbatê heye kêmtir be.
- Bi fermana Wezîrê Kar û Ewlehiya Civakî ya di 4/10/2021 de, **mehekê (1)** piştî şandina serlêdana parastina navneteweyî mafê gihîştina bazara kar ji Serlêderên Parastina Navneteweyî re tê dayîn. Dema ku serlêder mafê xebatê werdigire, **divê ew**:

  (a) di Tomara Xizmeta Kar a Giştî de wekî bêkar xwe tomar bike;

  (b) li ser bingeha fermana Wezîrê Kar û Ewlehiya Civakî, di warên taybetî diyarkirî de kar qebûl bike;

  (c) beşdarî perwerdehiya pîşeyî û/an kursên perwerdehiyê bibin, eger ji bo vê yekê werin vexwendin û fêrî zimanê Yewnanî bibin;

  (d) xizmetên rêbaza kesane ya ji hêla şêwirmendên pispor ên Xizmetên Giştî ve qebûl bikin;

  (e) civîn û serdanên mala xwe qebûl bikin ji bo nirxandina daneyan li cih, ji hêla karbidestên xizmetên civakî yên têkildar ve girêdayî plansazkirina çalakiyan ji bo şêwirmendiya pîşeyî û rêberî, û piştevaniya derûnî û bihêzkirina wan a civakî;

**Serlêderekî bo parastina navneteweyî ku seqet an bêkar an ji 63 salî mezintir be, ne hewce ye ku li Xizmeta Kar a Giştî tomar bike.**

## 3. <u>Endamên malbatê</u>

Endamê malbatê vê wateyê ku yek ji endamên jêrîn ên yekîneya malbata serlêder li wan deveran be ku ji hêla hukûmeta Komara Qibrisê ve têkildarî serîlêdanê tên kontrolkirin.

Bo mebestên lêkolîna serîlêdaneke bo Mercên Wergirtina Kelmelan, dê statûya serlêderî ji bo parastina navneteweyî jî ji hêla endamên malbata serlêder ve ku bi wan re rûdinin, were berçavgirtin, çi ew di serlêdana serlêder a ji bo parastina navneteweyî de cih bigirin çi serlêdana parastina navneteweyî bi serê xwe pêşkêş kiribin yan na:

a) hevjîn an hevpara serlêder, ku serlêder pê re dijî û ji bo mebestên niştecîbûnê li xaniyekî dimînin;

b) zarokên piçûk û nezewicî yên serlêder an serlêder û hevjîna wî, an jî hevpara ku di paragrafa (a) de hatiye destnîşankirin.

I. Zarokeke nezewicî ku hîn li dibistanê ye.

II. Zarokek nezewicî ku temenê wî gihîştiye 18 salî û li kar digere, tevî ku serlêdana parastina navneteweyî kiriye.
III. Zarokên nezewicî yên di navbera 18 û 23 salî de, eger ew perwerdeya bi rêkûpêk bibînin.

**4. <u>Mercên Wergirtina Kelmelan li gorî şertên jêrîn tên dayîn:</u>**

1. Dê serlêdanên ji aliyên têkildar bidin NAVENDA WERGIRTINA YEKEM, POURNA û hemû nivîsgehên rifahê yên navçeyî (berpirsên karbarên serlêdêrên paraastina navneteweyî) bi bikaranîna forma taybet a serlêdanê ya Xizmetên Rifaha Civakî, ku divê serlêdêr bi duristî tijî bike û digel hemû zanyarî û bawernameyên pêwîst be, ku birêveber bo vekolîna serlêdanê pêwîst dizane.

2. Eger daxwaz bi duristî bi hûrgiliyên kesane yên serlêdêr û endamên malbatê yan belgeyên erêkirina pênaseya serlêdêr neyên tijîkirin û yên malbatê pêvek nebin, ew dê neyên pejirandin.

3. Serlêdanên bêyî navnîşana cihê mayînê yan bi navnîşana nivîsgehên saziyên ne-dewletê, yan navnîşaneke cihê mayînê li avahiyeke ku, ser bingeha fermana yan hişdariya fermî ya nivîskî ji aliyê rayedarên têkildar ve, neguncaw hatiye ragihandin, dê neyên pejirandin.

4. Serlêdanên ji serlêdêrên li Navendên Wergirtin û Cîwarbûnê bo Serlêdêrên Parastina Navneteweyî dimînin dê neyên pejirandin.

5. Serlêdanên ji wan serlêdêrên ku navenda mayînê ya 'Limnes' wekî cihê mayînê bo wan hatiye diyarkirin dê neyên pejirandin.

6. Birêveberê Xizmetên Rifahê (herwiha nûnerên wan ên destûrdar) Mercên Wergirtina Kelmelan pêşkêş dikin.

7. Alîkariya malî bo dayîna pêdiviyên bingehîn (xwarin, cil û sol) û alîkariya malî bo dayîna ceryan, av û lêçûnên piçûk ên kesane bi çêkê yan rijandina nava hesabê bankê yê serlêdêrên parastina navneteweyî tê dabînkirin.

8. Qasa alîkariya malî bo dayîna lêçûnên piçûk ên kesane anegorî cihê mayînê yê serlêdêr diguhere.

9. Alîkariya malî bo dayîna alîkariya kirê û diravê pêş yê kirê bi çêkê yan rijandina nava hesabê bankê yê xwediyê xaniyî tê dabînkirin.

10. Diravê kirê ji dema imzekirina kirênameyê dikeve pêkanînê, ku dikeve ser roja erêbûna serlêdanê yan piştî wê. Her xwestek û daxwazên din ên kirêvanî (wek mînak, dayîna diravê av û ceryanê, lêçûnên bikaranîna

hevbeş, her xisara ku kirêvan bike) têkildarî xwediyê avahiyê ne û ne bo Xizmetên Rifaha Civakî.

11. Qasên kirê ya li cedvelên jorê nîşandayî, anegorî hejmara malbatê, qasa herî zêde ye ku tê dayîn. Eger qaseke kêmtir were lihevkirin, ev qasa kêm dê bidin xwediyê xaniyî.

12. Eger bi hev re jiyan heve, qasa giştî ya kirêya ku bidin xwediyê xaniyî dê li gorî cedvela jorê ji alîkariya malî ya kirê ya têkildarî hejmara kesên bi hev re dijîn pirtir nebe

13. Eger serlêdêr (mezinsal) li heman avahiyê de dijîn, qasa giştî ya kirêya bidin xwediyê xaniyî dê li gorî cedvela jorê ji alîkariya malî ya kirê ya têkildarî hejmara kesên bi hev re dijîn pirtir nebe. Bi tu awayî alîkariya giştî ya kirê nikare ji kirêya avahiyê pirtir be. Bi taybet, herî zêde du mezinsal dê di xaniyekî 1-odeyî, çar mezinsal di xaniyekî 2-odeyî û şeş mezinsal di xaniyekî 3-odeyî de werin cîwarkirin.
14. Xizmetên Rifaha Civakî heqê daxwaza bawernanemyên zêdetir yan zanyariyên din û wergirtina zanyarî û daneyan ji xizmet/beşên din têkildarî serlêdêr/kesên arîkarîbûyî û girêdayiyên wan, ku têkildarî serlêdanê ne, bo xwe parastî dibîne.

15. Eger serlêdêr û/yan endamê din ê malbatê idia dike ew nikarin ji ber pirsgirêkên tenduristiyê kar bikin, Komîteya Nirxanidina Taybet bi diyarbûna ji aliyê rayedarê têkildar ve dê şiyana karkirinê binirxîne.

16. Birêveberê Xizmetên Rifaha Civakî (herwiha nûnerê wî yê destûrdar) li cihê mayîna serlêdêr/kesê arîkarîbûyî her gava guncaw bizane naveroka serlêdanê û heqê yarmetiya berdewam erê bike hatin û çûyînan kontrol bike.

17. Her kesê Mercên Wergirtina Kelmelan werdigire neçar e demildest Xizmetên Rifaha Civakî ji her guherînê agahdar bike ku ser dayîna dirêv, berdewamî, kêmkirin yan bidawîanîna alîkariyê bandora wê heye.

18. Her sûdmendê ku gotin yan nîşaneyên nerast bibêje yan her zanyariyên kelmelan bi armanca wergirtin yan berdewamiya bidestanîna Mercên Wergirtina Kelmelan veşêre neçar e qasa ku ji Xizmetên Rifaha Civakî wergirtiye vegerîne û dikare bikeve ber cezayê qanûnê.

19. Alîkariya ku dê bidin sûdmendan dê ji roja dayîna serlêdanê ve dest pê bibe, bi mercê ku li gor naveroka qanûnê be.

## 5. <u>Bidawîbûna Mercên Wergirtina Kelmelan</u>

Eger kesek xwedanê mercên jêrê nebe, êdî nikare alîkariya Mercên Wergirtina Kelmelan wergire:

- Dema Xizmeta Penaberiyê rewşa parastina navneteweyî (rewşa penaberê siyasî û rewşa parastina temamker) bide.

- Dema rewşa serlêdêr kuta dibe. Bi taybet, rewşa serlêdêr heya wê rojê heye ku biryara serokê Xizmeta Penaberiyê pêkanînbar dibe **ji serlêdêr re tê ragihandin** û dawîdema itirazê dijî biryara serokê Xizmetên Penaberiyê derbas bûbe. Rewşa serlêdêr dê were berdewamkirin dema itirazê bo Dadgeha Îdarî ya Parastina Navneteweyî dijî biryara serokê Xizmetên Penaberiyê hatibe dayîn û heya weşana biryara dawîn a Dadgeha Îdarî. Bo biryareke neyînî li gor rêbaza asayî û dayîna rewşa parastina temamker, **divê itirazek di nava 30 rojan de were dayîn**. Bo biryareke neyînî li gor rêbaza rêya-zû, serlêdanên bi zelal bê bingeh, paşvegerandin û desteyên din ku li madeya 12A diyar bûne, **divê itirazek di nava 15 rojan de were dayîn.**
- Dema deverên bin kontrola Komara Qibrisê bo her demê biterikînin.
- Dema binçav bibin. Tê fêmkirin eger kesê binçavbûyî endamekî malbatê be, dayîna Mercên Wergirtina Kelmelan a malbatê dê berdewam be bêyî ku para kesê binçavbûyî berçav bigirin.
- Dema ew nehêlin birêveberê Xizmetên Civakî (herwiha nûnerê wî yê destûrdar) serdana xaniyê wan bike yan dayîna zanyariyan ser her mijarê red bikin ku dê di dirêjahiya nirxandinê yan dîsan-nirxandinê de bo dayîna Mercên Wergirtina Kelmelan ser biryarê bandorê dayîne.
- Dema ew çavkaniyên malî veşêrin û loma bi awayê nedurist ji Mercên Wergirtina Kelmelan sûd wergirtibin.
- Dema ew du caran pêşniyara kar li beş û serdemên destûrdar bi sebebên bi zelalî nepejiranbar/nemaqûl red bikin. Eger ew yan endamê din ê malbatê ku dikare kar bike lê red bike, ew dê ji lîsteya Xizmetên Kar ên Giştî werin jêbirin û bi vî awayî her alîkariya ku ser navê wê rewşê werdigirin dê ji dest bidin.
- Heqê dayîna serlêdaneke nû, piştî ku serlêdêr bi xwebexşî bêkar be, dê piştî 4 mehan were dayîn.
- Dema kar bidin serlêdêr, bo endamekî malbatê, dahata kar divê ji qasa alîkariya malî kêmtir be ku malbat werdigire, ku ser bingeha qasên diyarbûyî yên Mercên Wergirtina Kelmelan e. Eger na, Mercên Wergirtina Kelmelan dê bi dawî bibin.